K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Projeya Mastera Bêtez

# BERHEVKARIYA HÊMANÊN FOLKLORÊ LI ÇAR GUNDÊN NISÊBÎNÊ

Mehmet Öztürk

13721151

Şêwirmend

Doç. Alk. Dr. Necat KESKİN

Mêrdîn 2018

K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Projeya Mastera Bêtez

# BERHEVKARIYA HÊMANÊN FOLKLORÊ LI ÇAR GUNDÊN NISÊBÎNÊ

Mehmet Öztürk

13721151

Şêwirmend

Doç. Alk. Dr. Necat KESKİN

Mêrdîn 2018

# NAVEROK


**NAVEROK** ........ I
**KURTE** ........ 1
**ÖZET** ........ 1
**PÊŞGOTİN** ........ 2
**HÊMANÊN FOLKLORÊ Lİ GUNDÊN NISÊBÎNÊ** ........ 3
- **I. GUNDÊ ŞIWÊŞKÊ** ........ 3
- **II. TILYAQÛBÊ** ........ 5
- **III. GUNDÊ KERTWÊNÊ** ........ 7
- **IV. GUNDÊ SÊRWANÊ** ........ 10

**ENCAM** ........ 12
**PÊVEK** ........ 13

## KURTE

Di vê xebata me de armanca me ew e ku em derbarê hêmanên folklorî yên IV gundên navçeya Nisêbînê ya Mêrdînê berhev bikin. Bi wê mebestê me bi rûniştvanên gundên Sêrwan, Şiwêşkê, Kertwên û Tilyaqûbê re hevpeyvîn pêk anîn. Em dê bi vê xebata xwe zanyariyan û hurgiliyan derbarê folklora wan 4 gundan belav bikin.

## ÖZET

Bu anket çalışmamızda Mardin'in Nusaybin ilçesine bağlı, Topaçlı, Sirvan, Duruca, Tepealtı köyleri sakinleri röportajlar yapılarak köylerin folklor öğelerine ilişkin çalışma gerçekleştirilmiştir. Bu çalışmamızda söz konusu köylerin tarihi ve kültür öğelerine ilişkin bilgiler paylaşılacaktır.

# PÊŞGOTİN

Lêkolîner û akademîsyên her karê civakê weke folklorê pênase dikin û dinirxînin. Ne bi tenê kultur û adet her berhema civakê weke keresteyeke folklorîk şîrove dikin. Di nava çend salên dawiyê de derbarê çand kultur û folklora kurdî jî de xebatên derbarê folklora kurdî zêde bûne ev yek jî cihê kêfxweşiyê ye bo lêkolîner û xwînerên kurdî. Ji ber ku demeke dirêj kurdî hatibû qedexekirin û zimanên fermî yên weke erebî, tirkî, farisî, li ser kurdan hatibû sepandin û nebûna xebatên qadî guman tê de nîne bûye sedema wendabûa hêmanên folklora kurdan.

Me di vê xebata xwe de hewl da bi rûsipiyên gundên Sêrwan, Şiwêşkê, Kertwên û Tilyaqûbê yên Nisêbînê re anketekê derbarê hêmanên folklora kurdî de pêk bînin û wan hêmanên berê tomar bikin.

Di xebata xwe de em dê derbarê folklor, orf û adetên berê yên van gundan, orf û adetên niha li gund heyî zanyariyan be.

# HÊMANÊN FOLKLORÊ Lİ GUNDÊN NISÊBÎNÊ

## I. GUNDÊ ŞIWÊŞKÊ

Şiwêşkê teqrîben 12 kîlometreyan dûrî Nisêbînê ye û ser bi Nisêbînê ye. Teqrîben li gund 150 – 200 mirov dijîn.

**Nav û paşnavê bikarhêner: Mehmet Emin Öztürk**

**Zayend:** Mêr

**Rewşa Xwendinê:** Dibistana Navîn

**Jidayikbûn**: 01.04.1955

**Pîşe:** Cotkarî û sewalkarî

**Cihê berhevkirinê:** Şiwêşkê/ Topaçlı

**Dema berhevkirinê:** 18.12.2017

**Hikayeya Navê Gund**

Tê gotin ku gund gelekî kevn e û 2 caran xirab bûye û dîsa ava bûye. Xelkê gund ji eşîra Zaxuraniya ne û Malbata Hiso xwediyê gund in. Çîrokeke xisûsî ya navê gund nayê zanîn.

**Nasnameya etnîk ya kesên ku niha li gund dijîn**

Li gund îro bi tenê kurd kurmanc dijîn. Gundî karê cotkarî û sewalkariyê dikin. Li gund berî Zaxuraniya Çomerî hebûne ew jî kurd in û eşîrek in li herêmê. Heta niha nayê zanîn bê ka ti milletên din li gund jiyane yan na.

**Zimanên ku li gund tên axaftin û aboriya gund**

Zimanê gundiyan kurdî ye kurmancî ye. Gundî debara xwe bi cotkarî, sewalkariyê dikin.

**Jiyana çandî ya gund**

Li gund çalakiyên dişibihin weke paleyî, palûte quraftina rezan, xwedîkirina dermalan hebû. Aniha ew adet û kultur nemaye.  Belê zilaman xortan amadekariyên xwe dikirin. Nanê wan dihat amade kirin û diçû ser erd.

**Pîrozbahiyên rojên taybet li gund û derdora gund**

Li gund berê rojên weke Çarşema Reş, Serêsalê weke rojên pîroz dihatin hesibandin û dihatin pîrozkirin.  Berê pîrek û qîzên gund piştî meha adarê roja çarşemê ji xwe re derdiketin seyranê nan çêdikirin bo Çarşema Reş. Di Sersalê jî de gundiyan mewîj sawar li zarokan belav dikirin.

**Navê zîyaretên li gund û derdora gund**

**Li derdora gund bi navê Şêx Seîd ziyaretek heye.**

Çîroka ziyareta Şêx Seîd nayê zanîn lê gundî diherin lê dia dikin û xwe diavên bextê ziyaretê. Tê gotin Şêx Seîd qencekî Xwedê ye.

**Orf û adetên gund yên berê**

Li gund kirîvtî, nanê dawetan, nanê miriyan, xwestina keçikan weke orf û adetên berê hebûne. Niha jî kirîvtî berdewam dike lê ne di asta berê de ye. Li aliyê din nanê dawet û miriyan xwestina qîzan berdewam dike.  Berê keç û xortan beriya zewacê û xwestinê hev nedidîtin lê aniha ew guheriye û hevdu dibînin û hevdu nas dikin.

**Nexweşiyên tên zanîn û navên wan yê herêmî**

Li herêmê berê nexweşiyên weke, êşa dil (Kalp krizi), êşa zirav (Verem) Sorik, (Kızamık), bîrov (Ekzema), Mûmar (Tenya) hebûye. Li gund gelek zarok ji ber nexweşiya sorikan mirine. Herwiha li gund hekîmên kurmancî nebûne lê li gundê Timnarê Seyidên Mala Xudro bîrov birînê. Tê gotin hêkê kelandî û xweliyê tevlihev dikin û tûka xwe jî li nav dixin li bîrovan dikin. Li gund Birahîmê Xelîl hebû wî jî nigên heywan û mirovên şikestî dicebirand. Wî jî koça dawî kiriye.

**Li gund û derdorê dermanên kurmancî**

Şêx Sebrî hebû li mentîqê, bo şewatê bo balûkan derman çêkirine. Heger derek bişewitiya di nava sêlê de av dikelandin û bera ser didan. Ew bawerî heye ku şewat miqrobê dikuje. Fîşekek li yekî

biketa bi şûjineke sorkirî ew fîşek dihat derxistin û rûnê sorkirî bera birînê didan. Çav kul bibûya sîr bi serde dieciqandin û rihet dikirin.

**Çanda devkî li gund**

Li gund berê dengbêj nebû lê li gundê kêlekê li Tilyaqûbê dengbêj Sadiqê Gurikî hebûye. Behçeto hebûye. Hatine gund strane. Dengbêj Behçeto li Stenbolê dijî sax e. Sadiqê Gurikî miriye.

**Lîstikên zarok û mezinan**

Xortên gund berê holê, kaşo dilîstîn weke lîstika golfê ye. Ji xwe re ji darên berû kaşo çêdikirin û gog çêdikirin. Herwiha tûştê hebûye hem zarokan hem jî zilaman pê lîstiye. Pîrekan bi lîstika husomeyn û xîşkê, werîs lîstîne.

## II. GUNDÊ TILYAQÛBÊ

Gundê Tilyaqûbê teqrîben 10 kîlometreyan dûrî Nisêbînê ye. Li gund 150 mal hene. Rûniştvanen gund kurd in. Gund li ser Riya Îpekê ye.

**Nav û paşnavê bikarhêner:** Yusuf Öztürk

**Zayend:** Mêr

**Rewşa Xwendinê:** Dibistana Seretayî

**Pîşe:** Muxtar û cotkarî

**Cihê berhevkirinê:** Tilyaqûbê/ Tepealtı

**Dîroka berhevkirinê:** 18.12. 2017

**Hikayeya navê gund**

Gund li ser girekî ye. Beriya bi 300-400 salî gund yê ermeniyan bûye. Cihû û fileh li gund hebûne. Gund gelekî kevn e. Tê gotin ku gund navê xwe ji rahib Mor Yaqûbê hrîstiyanên herêmê stendiye.

**Nasnameya etnîk ya gund**

Li gund îro bi tenê kurd kurmanc dijîn. Ermenî, ereb, sûryan li gund tunene. Berê li gund, ermenî û cihû hebûne. Ew îro tunene.

**Zimanên ku li gund tên axaftin**

Zimanê gundiyan kurmancî ye. Zimanêkî din li gund nayê axaftin.

**Aboriya gund**

Gundî debara xwe bi cotkarî, sewalkariyê dikin. Karker li gund hene bazirganî heye. Herwiha gelek şofêr jî li gund hene ew jî li ser erebayan kar dikin.

**Jiyana Çandî Ya Gund**

Li gund çalakiyên dişibin weke testîval, palûte tuneye. Herkesî karê xwe kiriye.

**Pîrozbahiyên rojên taybet li gund**

Li gund berê pîrozbahiya serêsalê hebûne. Zarokên gund li nava malê geriyane. Qirdik, bûk û zava hatine çêkirin. Metelokên weke; "Serê salê binê salê Xwedê kurekî bide kevaniya malê. Serê salê binê salê Xwedê bereketê têxe vê malê" hatine gotin ji aliyê zarokan ve. Gundiyan jî savar, mewîj, li zarokan belav kirine. Aniha ew kultur li gund nema ye.

**Navê zîyaretên li gund û derdora gund**

Li derdora gund li Mendikanê bi navê Şêx Seîd ziyaretek heye. Li Girnewaz ziyaret heye.

Pîrek û zilam çûne ser wan ziyaretan dibêjin ê nexweş, ê bi cinan ketine li Girnewas baş dibin. Çîroka wê nayên zanin. Xwarin li wir hatiye çêkirin û belavkirin. Nanê şilikî li wir hatiye belav kirin. Nanê şilikî weke tilsim û adetekê li wir tê belavkirin.

**Orf û adetên gund yên berê**

Li gund weke adetên berê kirîvtî, nanê dawetan, nanê miriyan, xwestina keçikan hebûne. Ew adet hîn jî berdewam dikin. Tê gotin kiriv ji hev nedizewicîn ew li kirîva heram bû.

Li gund aniha jî kirîvtî berdewam dike lê ew samîmîyet ne weke berê ye. Li aliyê din nanê dawet û miriyan xwestina qîzan berdewam dike. Mewlûda miriyan berdewam dike. Çûna ser taziyan heye. Berê di xwestina keç û xortan qelen hebûye lê ew adet aniha nema ye.

**Nexweşiyên berê yên herêmî**

Li gun berê nexweşiyên weke, mîrkutok – sorik (Kızamık), Bîrov, (Ekzema) hebûne. Gelek kes li gund ji ber nexweşiyan mirine. Xisûsî jî zarok berê ji ber nexweşiyên mirine.

Li gund jinên weke navê, Heda Sado, Emîna hebûne wan bîrov derman kirine. Ew jî mirîne aniha ti kes li gund nîne yên nexweşiyan derman dikin. Tê gotin berê pîrekan hêka mirîşkê ya roja çarşemê dikir dikelandin û di bîrovan didan. Wisa rihet dikirin. Ew jî ji kal û pîrên xwe fêr bûne. Dema yek birîndar bibûya fîşeka wî bi şûjinê derdixistin. Dûre herî sor dikirin û dixistin birînê. Heger yek ji xanî biketa eyarê pêz lê digerandin û ew kes baş dibû. Hekîmên kurmancî ev tişt ji gundiyan re gotine.

çanda devkî li gund

Berê dengbêj li gund hebûne. Derwêş jî dihatin gund. Xişt li xwe dixistin. Li gund dengbêjê bi navê Sadiqê Gurikî hebûye ew çûye rehmetê. Miradê Kinê, Zekî, Bahçeto ev jî mirtiv bûn êvara îda hatine gund ew adet hîn jî berdewam dikin. Li gund Beşîrê Silo hebûye çîrok gotine. Hesoyê Xelîl, Çeçanê Tarîvoro ji gund bûye wî jî çîrok gotine. Tê gotin Çaçanê Tarîvoro hefteyekê çîroka Rustemê Zal digot çîrokbêjên gund hemû mirine.

**Lîstikên zarokû mezinan**

Xortên gund berê bi lîstikên weke holê, tûştê, kaşo, kerikê dirêj lîstin. Listîkên keçikan jî hebûn keçikan bi werîs lîstine. Holê weke futbolê bûye. 20 xort li aliyekî û 20 xort li aliyekî bûne kê gog bivêta aliyê kê wan qezenç dikir. Zilaman bi daran li gogê dixistine kê gog nêzîkî kîjan alî bikira wî aliya qezenç dikir.

**III. GUNDÊ KERTWÊNÊ**

Kertwênê teqrîben 10 kîlometreyan dûrî Nîsêbînê ye. Nifûsa gund zêdetir ji 5 hezara ye. Gund ser bi Nisêbînê ve ye.

**Nav û paşnavê bikarhêner:** Mehmet Selim Fidan

**Zayend:** Mêr

**Rewşa Xwendinê:** Dibistana seretayî

**Pîşe**:  Cotkar

**Jidayikbûn:** 01.02.1944

**Navê gund:** Kertwênê/ Duruca

**Cihê berhevkirinê:** Kertwênê/ Duruca

**Dema berhevkirinê:** 18. 12. 2017

**Hikayeya navê gund**

Gund beriya bi 200- 300 salî ava bûye. Tê gotin xelkê gund ji Kerboranê ber bi aliyê Nisêbînê ve hatine û wan gund ava kiriye.

**Nasnameya etnîkî ya kesên ku niha li gund dijîn**

Li gund îro bi tenê kurd kurmanc dijîn. Ji bilî kurdan ti kes li gund nîne.  Tê gotin kalik û bapiran Kêrtwêniyan gund ava kiribe.

**Zimanên ku li gund tên axaftin**

Zimanê gundiyan kurdiya kurmancî ye.

**Aboriya gund**

Gundî debara xwe bi cotkarî, sewalkariyê dikin. Bazirganiyê dikin.

**Jiyana çandî ya gund**

Li gund çalakiyên weke festîval û mîhrîcan, quraftina rezan, palûteyê nebûye. Ew kultur aniha jî nîne.

**Pîrozbahiyên rojên taybet li gund û derdora gund**

Li gund berê Cejna Heciyan (Cejna Qurbanê) û Cejna Remezanê bi kêfxweşî dihatin pêşwazî kirin. Ziyafet dihatin çêkirin. Gencên gun govend digirtin, lihev kom dibûn kêfa xwe ji wan rojan re dianîn. Bo ziyafetê jî li ser banga mele gundiyan nan amade dikir û dibirin camiyê. Niha ew adet nema ye.

**Navê zîyaretên li gund û derdora gund**

Li derdora gund bi navê Pîr Xetab ziyaretek heye. Tê gotin ku Pîr Xetab qencekî Xwedê ye. Jinên zarok ji wan re çênabin diherin wê ziyaretê û dia dikin. Herwiha li gor derfetên xwe sewalan jê dikin û dikin qurbanî.

**Orf û adetên gund yên berê**

Li gund kirîvtî, nanê dawetan, nanê miriyan, xwestina keçikan weke orf û adetên berê hebûne.

Aniha jî li gund kirîvtî, nanê dawet û miriyan xwestina qîzan berdewam dike.  Berê keç û xortan beriya zewacê û xwestinê hev nedidîtin lê aniha ew guheriye û hevdu dibînin û hevdu nas dikin.

**Nexweşiyên tên zanîn û navên wan yê herêmî**

Li herêmê berê nexweşiyên weke, sorik - xurî (Kızamık), qolinc (Sancı) hatine dîtin. Dema çavên însanan kul dibû li gund, pîrekeka bi navê Gulê ji avasor û şekir derman çêkiriye û bera çavan daye û ew çav derman kirine. Gulê ji kalik û pîrên xwe fêrî çêkirina wî dermanê çavan bûye. Nihal i gund ti kes nema ye. Gulê jî wefat kiriye. Herwiha li gund berê kesekî ta bigirta ango bircifiya, benek ango tayek li destê wî digerandin bo ku taya wî ricifandina wî derbas bibe.

**Çanda devkî li gund**

Li gund berê dengbêj nebûne lêbelê berê derwêş û dengbêj hatine gund û stirane. Ji aliyê herêma Torê dengbêj hatine. Ji gundê Erbetê dengbêj hatine navê yekî ji wan Osmanê Xerabenî bûye.

**Lîstikên zarokû mezinan**

Zarokên 14 – 15 salî berê li gund bi tûştê lîstîne. Zarokan kesek dikirin bûk û hilkek datanîn û xwe vedişartin. Kî bihata li hilkê bida digot tûş. Herwiha berê li gund, zarokan, gencan bi teyrûman dilîstin. Çavê hev digirtin û navê hev digotin. Kê navê kê bigota bi destmala li pişta hev didan.

## IV. GUNDÊ SÊRWANÊ

Gund ser bi Nisêbînê ve ye. Li gund teqrîben 10 – 15 mal hene. Di navbera Nisêbîn û Hezexê de cî digire.

**Nav û paşnavê bikarhêner:** Cemil Serhanoğlu

**Zayend:** Mêr

**Rewşa Xwendinê:** Dibistana Seretayî

**Pîşe:** Cotkarî

**Jidayikbûn:** 01.02.1945

**Navê gund:** Sêrwan, Sirwan, Nisêbîn / Nusaybin

**Cihê berhevkariyê:** Nisêbîn

**Hikayeya navê gund**

Li ser girê gund sûhrek heye. Tê gotin gund navê xwe jî wê suhrê girtiye. Gund gelekî kevn e.

**Nasnameya etnîk ya gund**

Aniha li gund kurd dijîn û gundê kurmancan e Dibêjin gund berê yê lawê kralekî ye. Em nizanin bê ka beriya kurmancan kîjan millet li gund hebûne. Ew kral kî ye nayê zanîn.

**Zimanên ku li gund tên axaftin**

Zimanê gundiyan kurmancî ye.

**Aboriya gund**

Gundî debara xwe bi cotkarî, sewalkariyê dikin.

**Jiyana çandî ya gund**

Li gund çalakiyên palûtê, quraftina rezan, paleyî hebûye. Xortên gund li hev kom dibûn nanê xwe çêdikirin û diçûn ser karê xwe. Niha ew adet tuneye.

**Pîrozbahiyên rojên taybet li gund û derdora gund**

Li gund berê pîrozbahiya serêsalê hebûye û ew dihat pîroz kirin. Herwiha bi navê Êvara Seydikê rojek hebûye. Di sersalê de qirdik, bûk û zava dihatin çêkirin. dîlok dihatin gotin. Xort û zarok digeriyan ew amadekariyên roja sersalê bûn. Herwiha di Êvara Seydikê de jî dara benikê dişewitandin. Tê gotin ku bîna wê darê gelekî xweş bûye.

**Navê zîyaretên li gund û derdora gund**

Li derdora gund Ziyareta Şêx Qasim heye. Çîroka wê ziyaretê nayê zanin. Lê tê gotin Şêx Qasim alimekî Xwedê bûye xelkê bi navê wî û serê wî sond dixwar.

**Orf û adetên gund yên berê**

Li gund nanê dawetan, nanê miriyan, xwestina keçikan weke orf û adetên berê hebûne. Mewlîd dihat dayîn. Roja mirî dimir kefaret belav dikirin. Aniha jî kirîvtî berdewam dike lê ne weke berê zêdeye. Li aliyê din nanê dawet û miriyan xwestina qîzan berdewam dike. Mewlûda miriyan berdewam dike.

**Nexweşiyên tên zanîn û navên wan yên herêmî**

Li gund berê nexweşiyên weke, xurî– sorik (Kızamık), bîrov, (Ekzema) hebûne. Kal û pîran tecrûbeyên xwe yên derbarê nexweşiyande gotine. Gundiyan jî ji wan tecrûbeyan îstîfade kiriye. Herwiha, Tahirê Hewrî hebûye berê li mentîqê dest û piyên însana bişîkesta wî ew dicebirand.

Herwiha tê gotin ku hekîmên kurmancî ji bo devereke însan ku diecîqe mûyê bizina hît û rûn berenava hev didan û lê dikirin ew rihet dibû. Wexta guhê însanan biêşiya şîrê pîreka bera guhê wan didan. Heger çavê însanan kul bibûya dermanê qurmiz hazir dikirin û bera çavên wan didan.

**Çanda devkî li gund**

Li gund berê dengbêj hebûne. Dengbêj Hefsûno Êzdî bû li gund distira. Axayê gund li dengbêjan dinerî. Debara xwe wisa dikirin. Dengbêj Hefsûno miriye. Aniha mirtiv hene.

**Lîstikên zarokû mezinan**

Li gund xortan bi hingulîskê, bi holê, tûştê dilîstin. 50- 60 zilam li hev rûdiniştin û bi hungilîskê dilîstin. Hungilîsk digerandin. Hungulîsk di dawa kê de bûya wî wenda dikir. Herwiha zarokan û gencan bi tûştê dilîst. Kaşo hebûn ji daran dihatin çêkirin.

# ENCAM

Lêkolîn û berhevkariya hêmanên folklorê yên 4 gundên Nisêbînê de em li wê çendê rast hatin ku tesîr û serdestiyeke tirkî li ser herêmê heye û ew jî bûye sedem ku gelek hêmanên folklora herêmê wenda bibin û bêne ji bîr kirin. Rûsipî û kalemêrên herêmê yên bersiva anketên me dan jî aşkere dikin ku gelek adet û orfên kurdan hatine ji bîrkirin û ew niha ji aliyê ciwanan ve nayê zanîn. Bo wê dikarin vê tesbîtê bikin ku pêdiviya folklora kurdî bi lêkolînên meydanî yên berfireh heye. Bi tesnîf, tomar û berhevkariyeke ciddî gelek hêmanên folklorî yên Nisêbînê jî dê di nava lîteratura folklora kurdî de cîh bigre.

## PÊVEK

**Wêne: I Gundê Sêrwanê**



**Wêne II: Ligel rûniştvanê gundê Sêrwanê Cemil Serhanoğlu**



**Wêne III: Gundê Kertwênê**



**Wênê IV: Ligel Mehmet Selim Fidan rûniştvanê Kertwênê**



**Wêne V:  Ligel Mehmet Emin Öztürk li Şiwêşkê**



**Wêne VI:  Gundê Tilyaqûbê**



**Wêne VII: Yusuf Öztürk**



T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Tezsiz Yüksek Lisans Projesi

# NUSAYBİN'İN DÖRT KÖYÜNDE FOLKLOR ÖĞELERİNE İLİŞKİN ANKET ÇALIŞMASI

Mehmet Öztürk

13721151

Danışman

Yrd. Doç. Dr. Necat KESKİN

Mardin 2017

T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Tezsiz Yüksek Lisans Projesi

# NUSAYBİN'İN DÖRT KÖYÜNDE FOLKLOR ÖĞELERİNE İLİŞKİN ANKET ÇALIŞMASI

Mehmet Öztürk

13721151

Danışman

Yrd. Doç. Dr. Necat KESKİN

Mardin 2018